Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :432 nameronahi@gmail.com 12- Tebax - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Gav bi gav rizgarkirina Minbicê –3–

Cûma MIHEMED
Şîlan MIHEMED

Hejmareke fermandar û şervanên beşdarî hemleya rizgarkirina Minbicê bûne diyar kirin ku pevçûnên li taxa El-Hezwanê rû dane gelekî dijwar bûn û dane zanîn ku çeteyan hemû giraniya xwe xistin vê taxê.

Çeteyên DAIŞ'ê di şerê xwe yê hundirê bajarê Minbicê de xwe spart sekvanan, mayin û seyareyên bombebarkirî. Fermandarê Giştî yê Tabûrên Şems El-Şemal Egîd Ehmed diyar kir ku ev rêbaza şer di hundirê taxa El-Hezwanê de zêde bû.

Ehmed li ser pevçûnên li taxa El-Hezwanê wiha got: "Rojane nuqteyeke şervanan bi seyareyên bombebarkirî dihat armancgirtin. Hin caran em pêşve diçûn, li paş me teqîn pêk dihatin. Hilweşandina avahiyan li taxa El-Hezwanê di encama mayinan û seyareyên bombebarkirî de çêdibû.

Şervanê Tabûra Şems El-Şemal ê bi navê Debûr Minbic ku beşdarî pevçûnên li taxa El-Hezwanê bûbû, diyar kir ku pevçûnên herî dijwar li vê taxê bûn û got: "Piştî 25 rojan ji şer û pevçûnan em derbasî taxa El-Hezwanê bûn."

Debûr Minbic wiha dewam kir: "Taxa El-Hezwanê mezintirîn taxe û rizgarkirina vê taxê tê wateya ku giştî bajarê Minbicê li ber rizgarkirinê ye. Çeteyên DAIŞ'ê yên li vê taxê şer dikirin biyanî bûn. Me ew bi cenazeyan nas kirin. Minbic deriyê çeteyan ber bi Ewropa ve bû û ji ber vê yekê rizgarkirina wê dijwar bû, piraniya çeteyên di bajêr de biyanî bûn û bi rêya Tirkiyê derbasî Sûriyê bûbûn."

### RIZGARKIRINA SIVÎLAN

Çeteyên DAIŞ'ê nehişt ku welatiyên sivîl ji bajêr derkevin û ji xwe re weke mertalên zindî bi kar dianîn. Vê yekê hişt ku peywira şervanên Meclisa Leşkerî ya Minbicê dijwartir bibe.

Li taxa El-Hezwanê çeteyên DAIŞ'ê hemû welatiyên sivîl ber bi nîvê bajêr ve birin û xwe ji şerekî vekirî re amade kir. Hejmareke kêm ji welatiyên sivîl karibûn ji destên çeteyan birevin û xwe bigihînin deverên rizgarkirî.

Egîd Ehmed behsa komkujiyeke çeteyên DAIŞ'ê li dijî sivîlan kir û wiha got: "Dema ku em ji rêya Bazarê ve nêzîk bûn, hejmareke welatiyên sivîl berê xwe dan nuqteyên şervanên me û di encamê de sekvanên DAIŞ'ê ew armanc girtin û 9 ji welatiyên sivîl şehîd bûn."

Egîd Ehmed diyar kir ku di rojekê de 3 hezar û 500 welatiyên sivîl rizgar kirin. Egîd Ehmed wiha dewam kir: "Di vê navberê de çeteyên DAIŞ'ê êrîşî me kir û welatiyên sivîl tavilê belav bûn û mayînek bi sewalan de teqiyan û tenê sivîlek birîndar bû. Sekvanên DAIŞ'ê jî ji gelek aliyan ve em armanc digirtin."

Şervanan sivîl li gorî hatiye plankirin rizgar dikin da ku ji deverên pevçûnan bêne dûrxistin. Ev çalakî hemû bi rêya telefonên rasterast bi welatiyên sivîlan ên bajarê Minbicê re pêk hatin.


Egîd Ehmed bal kişand ku hejmara şervanên Tabûra Şems El-Şemal di wê demê de nêzî 250 şervanan bû û xizmên hemûyan di hundirê bajêr de hebûn û peywendî bi xizmên xwe re dikirin û bi piraniya sivîlan bi rêya peywendiya van şervanan hatin rizgarkirin.

Şervanê tabûra Şems El-Şemal ê bi navê Fehed El-Labîde piştî ku beşdarî pevçûnên rizgarkirina embaran bû berê xwe da taxên rojavayê Minbicê. Di pevçûnekê de Fehed li rex 5 hevrêyên xwe êrîşî avahiya "El-Şerhiyê" kir. Piştî ku derbasî avahiyê bûn çeteyên DAIŞ'ê êrîşa xwe ya li dijî wan dest pê kir. Fehed wiha behsa wan kêliyan dike: "Piştî ku em derbasî avahiyê bûn, çeteyan wekî baranê gule bi ser me de rewşandin. Wan dixwest me mijûl bikin û di heman demê de komeke din a çeteyan derbasî jêrzemîna heman avahiyê bûn. Piştre çete derketin qata yekemîn û em jî di qatê duyemîn de bûn. Çeteyan bang li me dikir ku em xwe radestî wan bikin. Hejmara wan zêde bû. Li qata yekemîn agir vêxistin û piştî du saetan me şer kir em ji avahiyê derketin."

### TAXA DAWÎ YA MINBICÊ

Di rojeke înê de taxa dawî ya di destên çeteyan de mabû, taxa El-Sirb bû û çete tenê di sê kolanên wê de mabûn. Li rex çeteyan bi hezaran sivîl hatibûn komkirin da ku ji xwe re wek mertalên zindî bi kar bîne.

Ji bo parastina jiyana sivîlan şervanên Meclîsa Leşkerî ya Minbicê û Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) nexwestin hemleyeke leşkerî li vê taxê pêk bînin. Tevgereke leşkerî dibe ku jiyana sivîlan bixe xetereyeke mezin. Ji ber vê yekê şervan neçar man daxwaza çeteyan pêk bînin û rê ji wan re ber bi





Cerablûsê ve vekin.

Fehed El-Labîde dibêje ku wî dît ku çawa çete ji Minbicê ber bi Cerablûsê ve vekişiyan û got, "Her çeteyekî xwe di nava 10 sivîlan de vedişart û hemûyan kemberên teqemenî li xwe kiribûn. Me xwest taxa El-Sirb beriya vekişandina çeteyan rizgar bikin, lê dema em ji taxê nêzîk dibûn çeteyan sivîl weke bend didan pêşiya me."

Fehed El-Labîde kêfxweşiya xwe bi rizgarkirina giştî bajêr anî ziman û diyar kir ku wan tavilê dest bi hemleya paqijkirina mayinan kir da ku di demeke lezgîn de welatiyên bajêr vegerin malên xwe.

Fermandarê tabûrên Şems El-Şemal Egîd Ehmed kêliyên rizgarkirina taxa dawîn a bajarê Minbicê wiha anî ziman: "Ez ne li eniyên taxa El-Sirb bûm, min xwest ez kêliyên rizgarkirina taxa dawîn bibînim. Min nûçeya rizgarkirinê li ser bêtêlê bihîst."

Egîd Ehmed diyar kir ku di wê demê de wî li rex hin şervanên din ên QSD'ê pêşwaziya sivîlan dikir û got: "Gelek sivîlan bawer nedikirin ku em şervanên QSD'ê ne û guman dikirin ku em çeteyên DAIŞ'ê ne û cilên QSD'ê li xwe kirine. Ji ber ku buyerên bi vî rengî çeteyên DAIŞ'ê gelek caran kiribûn. Pîremêrek nêzîkî min bû û destên xwe li rûyê min xist û got, " êdî van dirêj neke." Jinan cilên reş dişewitandin û hin zilaman ku ev çend sal in cixare nekişandine, dikişandin."

### ME WÊNEYÊ EBÛ LEYLA DALIQAND

Egîd Şems El-Şemal behsa kêliya herî xemgîn û ya di hemleya rizgarkirina Minbicê de



kir û wiha got: "Tişta ku ne pêkane di hemû qonaxên hemeleya rizgarkirina Minbicê de were jibîrkirin, ew e u me şehîd Feysel Ebû Leyla û gelek hevalên hemleyê winda kirin û şehîd bûn. Şehadeta Feysel Ebû Leyla gelekî bandor li me kiribû. Ji bo bîranîna şehîd Ebû Leyla û ji bo pêkanîna dilsoziya me bi wî re di roja yekemîn a rizgarkirina bajêr de me wêneyekî şehîd Ebû Leyla li çerxerêya El-Beta daliqand."


Birayê Egîd Şems El-Şemal Mistefa Ehmed piştî sê rojan ji şehadeta Feysel Ebû Leyla şehîd bû û derbarê şehadeta birayê xwe de wiha got: "Beriya şehîd bibe em ji hev xeyidîbûn, beriya ku şehîd bibe hat ba min û em li hev hatin û min soz da dayika xwe ku ez carekê bi xwe re bînim malê, lê di roja din de min ew wek şehîd bir malê."

Egîd Şems El-Şemal behsa şehadeta du birayan kir û wiha got: "Piştî ku şervanê me Îsmaîl şehîd bû me malbata wî di destpêkê de agahdar nekir, lê piştî 15 rojan birayê wî jî şehîd bû."

Bajarê Minbicê û gundewarê wê di 12'ê Tebaxê de ji destên çeteyan hate rizgarkirin û rûpela reş di dîroka bajêr de hate girtin. Êdî welatiyên Minbicê bi awayekî demokratîk û azad dijîn.

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 432 12- Tebax- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Xezeba Zeytûnê lêda; çeteyek hate kuştin




Şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê çeteyan dişopînin û wan yek bi yek ceza dikin. Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê roja 10'ê mehê ji bo raya giştî daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku çeteyekî girêdayî çeteyên Tîma El-Sultan Mûrad di encama çalakiya li gundê Ziyadiye yê navçeya Exterîn hate kuştin. *R-2*

# DAWIYA WAN NÊZÎK DIBE KIRYARÊN HOVANE ZÊDE DIKIN

***Êdî dawiya dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê li Sûriyê nêzîk buye. Armancên dewleta dagirker a Tirk ya li Sûriyê, ku bi komên çete re hevkariya xwe didomîne, êdî di her alî de eşkere buye. Hemû hesabên ku li ser Sûriyê di pêşengiya Tirkiyê de hatin kirin jî têk çûn.***



Serokê Desteya Karûbarên Derve ya Efrînê Silêman Cafer diyar kir ku dewleta Tirk ji bo ku armancên xwe bi pêk bîne komên çete bikartîne û got, "Dawiya dagirkeriyê li Efrînê nêzîk dibe, lewra jî kiryarên xwe yên hovane zêde kirine." Silêman Cafer bang li civaka navnetewî kir ku li dijî dagirkeriya dewleta Tirk bibin xwedî helwest. *R-4*

Hevserokê PYD'ê Şahoz Hesen jî got, "Her kes behsa çareseriya siyasî li Sûriyê dike, lê divê gavên erênî ber bi çareseriya Sûriyê ve bên avêtin. Tirkiye xwedî heman zihniyeta rêxistininên çete DAIŞ û El Nusra ye. Bêyî rizgarkirina Efrînê û derxistina dagirkeriyê ji xaka Sûriyê çareseriya siyasî ne pêkane ye." *R-4*

## Rêveberiya Şengalê biryarên girîng girt




Desteya Rêveber a Şengalê, civîna xwe ya asayî lidar xist. Di civînê de bi minaseta 14 û 15'ê Tebaxê ku salvegera komkujiyên gundê Koço, Sîba Şêxidir û Til Izêr in, bernameya çalakiyan hat derxistin. Desteyê her wiha ji bo ji nûve avakirina cihên pîroz û xizmetguzariyê jî komîte ava kirin. *R-5*

## Heta vegerê berxwedan wê dewam bike

Berxwedana gelê Efrînê yê ji ber êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk li herêma Şehbayê bi cih bûne, berdewam dike. Rêveberên meclîsên herêma Şehbayê yên jin diyar kirin, ew tevî hemû kêmderfetiyan jî xizmeta gel dikin û pêdiviyên wan bi cih tînin. Rayedaran diyar kirin heta ku gel vegerin Efrînê wê berxwedana xwe dewam bikin. *R-3*



## Banqe û şîrketên Tirk wê hilweşin




Nirxê lîreyê Tirk li bara Dolarê Amerîkayê kêm dibe, pisporên biyanî ên aboriyê dibêjin Tirkiye wê nikaribe ji bin vê krîzê rabe û pêşî banqe, piştre jî şîrket wê birûxin. Li gorî pisporên biyanî ên aboriyê Tirkiye nema dikare ji bin vê krîzê rabe û fatûraya krîzê li pey hev wê li saziyên fînansê û piştre li şîrketan were birrîn. *R-25*

## DYA'yê şerê aborî da destpêkirin

Serokwezîrê Rûsyayê Dîmîtrî Medvedev li ser zextên aborî yên Washîngtonê yên li ser Moskowê got, "Ragihandina şerê aborî ye. Bi teqezî divê mirov bersivê bide vî şerî. Bi rêyên aborî, siyasî û rêyên din. Divê dostên me yên Amerîkî bi vê zanibin." *R-5*

## HPG'ê lê da, 8 leşker hatin kuştin



Li bakurê Kurdsitanê gêrîlayên HPG'ê bi çalakiyên bi bandor derbên giran li artêşa Tirk didin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê têkildarî çalakiyên gerîla yên li Colemêrgê daxuyayeniyek nivîskî weşand. HPG'ê ragihand ku li Colemêrgê 8 leşkerên Tirk hatin e kuştin. HPG'ê diyar kir ku li Wan û Geverê 4 gerîla şehîd bûne. *R-2*

## Li gundê Hemamê çeteyan 6 kes revandin


Leşker û çeteyên dagirker li Efrînê êrîşên xwe yên hovane li ser gel didomînin. Li gorî agahiyên ku ji herêmê hatin wergirtin, li gundê Hemamê ya navçeya Cindirêsê çeteyên koma Hemzet ketine malekê û ji yek malê 6 kes revandine. *R-2*

## Avakirina komîteyan ji bo berdewamkirina têkiliyan e



MSD'ê û rêjîmê di 26'ê Tîrmehê de li Şamê hevdîtin pêkanîbûn û biyara avakirina komîteyan girtibûn. Endamê Desteya Siyasî ya MSD'ê Hesen Mihemed Elî diyar kir ku armanca wan ji avakirina komîteyan, ji bo berdewamkirina hevdîtinan û têkiliyên di navbera her du aliyan de ye. *R-4*

## Tecrîd li dijî pîvanên navnetewî ye



Nerazîbûnên li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan zêde dibin. Cîgirê hevserokê Meclisa Şedadê Yasir Ebas diyar kir ku tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li dijî pîvanên navneteweyî û destnîşan kir ku kir ku armanca dewleta tirk a dagirker ji tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, pêşî girtina projeya netewa demokratîk e." *R-4*

## Divê bi têkoşîna gel pirsgirêka Îranê çareser bibe



Sekreterê Rêxistina Kurdistanî ya Hizbî Komunîst a Îranê (Komele) Îbrahîm Elîzade diyar kir ku destwerdana derve ya li ser Îranê wê encamê negire û got, "kesên ku behsa destwerdana derve dikin baweriya wan bi encamgirtina têkoşîna gel nayê. Alternatîfek radîkal dikare encamê bigire." *R-4*

## Rejîma Sûriyê xwest teslîm bibin *R-5*

## Trûmp zextên nû yên 'gumrikê' li Tirkiyê kir *R-2*

# Xezeba Zeytûnê lêda; çeteyek hate kuştin

**Şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê çeteyan dişopînin û wan yek bi yek ceza dikin. Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê roja 10'ê mehê ji bo raya giştî daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku çeteyekî girêdayî çeteyên Tîma El-Sultan Mûrad di encama çalakiya li gundê Ziyadiye yê navçeya Exterîn hate kuştin.**




Odeya Çalakiyên a Xezeba Zeytûnê li navçeya Exterîn a girêdayî herêma Ezazê ya bakurê Helebê çalakiyek pêk anî. Di encama wê de çeteyekî girêdayî Tîma El-Sultan Mûrad hate kuştin.
Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê roja 10'ê mehê ji bo raya giştî daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku çeteyekî girêdayî çeteyên Tîma El-Sultan Mûrad di encama çalakiya li gundê Ziyadiye yê navçeya Exterîn hate kuştin.
Daxuyanî wiha ye:
"Yekîneyên me yên Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê di 8`ê Tebaxê 2018`an de li herêma Extrîn a Ezazê li gundê Ziyadiye ji bo bersivdayîna kiryarên çeteyan li ser şêniyên Efrînê û talankirina mal û milkên wan, çalakiyek pêk anî. Yekîneyên me tevgera yek ji çeteyên Sultan Mûrad şopand da ku cezayê derbarê kiryarên ku li ser şêniyan pêk dianî, hat cezakirin. Em wek Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê soz didin ku çete li ku derê bin em ê tolê rakin. Efrînê, sebrê bikişîne, serkeftin tê."

## HPG'ê lê da, 8 leşker hatin kuştin



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê têkildarî çalakiyên gerîla yên li Colemêrgê agahî da. HPG'ê diyar kir ku li Şemzînan û Çelê yên Colemêrgê 8 leşker hatine kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê têkildarî çalakiyên gerîla yên li Colemêrgê daxuyayeniyek nivîskî weşand. HPG'ê ragihand ku li Colemêrgê 8 leşkerên Tirk hatin e kuştin. HPG'ê diyar kir ku li Wan û Geverê 4 gerîla şehîd bûne.
HPG'ê ev agahî parve kir;
"Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de li Colemêrgê li dijî artêşa TC'ê ya dagirker rêze çalakî lidarxistin. Agahiyên berfireh yên çalakiyan wiha ne;
Roja 9'ê Tebaxê seat 09:15'an de hêzên me li dijî qereqola Sunê ya herêma Rûbarok ya Şemzînanê çalakiyek li dar xist. Di çalakiyê de leşkerek hate kuştin.
Heman rojê seat 11:00'an hêzên me li girê Koordîne yê navçeya Çelê li dijî artêşa TC'ê ya dagirker çalakiyek li dar xist. Bi serketî li çeper û baregehên dijmin hate xistin û 7 leşker hatin kuştin.
Şeva 8'ê Tebaxê artêşa TC'ê ya dagirker li herêma gundê Meskan yê navçeya Gever a Colemêrgê operasyonek da destpêkirin. Sibeha 9'ê Tebaxê di navbera yekîneyeke ya me dema ku li ser erka xwe bûn û hêzên dagirker de şerekî giran derket. Di vî şerî de rêhevalên me Reşîd û Rizgar derbên giran li dijmin xist û heta fîşeka xwe ya dawî bi qehremantî şer kirin û şehîd bûn.
Piştî çalakiyê artêşa TC'ê ya dagirker li herêmê operasyonek da destpêkirin. Di navbera hêzên me û dijminê ku teknîka giran bikartîne şerekî giran derket. Di vî şerî de rêhevalên me Cemîl û Çiyager li dijî dijmin bi fedaî şer kirin û şehîd bûn."

## Trûmp zextên nû yên 'gumrikê' li Tirkiyê kir



Serok Dewletê DYA'yê Donald Trûmp, baca ku ji gumrikan ji alimînyom û pola yên ji Tirkiyê dihatin kirîn du qat zêde kir.
Li gorî daxuyaniya Serokê DYA'yê ya li ser Twîtterê parvekirî, hate destnîşankirin ku baca alimînyom û pola yên ku ji Tirkiyê tên kirîn du qat zêde kiriye.
Trûmp di peyama xwe de wiha dibêje: "Lîreyê Tirkiyê li pêşberî dolarê me yê bi hêz her ku diçe nirx winda dike, min du qat zêdekirina baca gumrikê ya pola û alimînyoma ku ji Tirkiyê tê kirrîn, pejirandiye. Li gorî vê ji bo alimînyom ji sedî 20, pola jî ji sedî 50 ye. Têkiliyên me di vê demê de bi Tirkiyê re nebaş in!"
Piştî peyama Trûmp û şûnde, lîreyê Tirkiye nirxê xwe winda dike. Lîreyê Tirkiye li hember dolar, eûro û sterlîn rekorên nû dişkîne..

## Grêva xebatkarên rêya hesin didome



Li Îranê xebatkarên rêya hesin ji 20'ê Tîrmehê ve di grêvê de ne. Komeke xebatkaran gotin heta ku daxwazên wan bi cih bên ew ê grêvê bidomînin.
Xebatkarên rêya hesin ev du meh in mehmiza wan nadin wan, bi vê mebestê ji 20'ê Tîrmehê ve li Arak, Azerbaycan, Îsfehan, Xoresan, Lorîstan û Zencanê grêvê dikin.
Li ser navê çalageran daxuyaniyek hate dayin û hate gotin bi hezaran xebatkarên rêya hesin yên ji lênerîna rêya hesin berpirs bi taloqkirî mehmiza xwe distînin. Çalakgeran gotin divê kontrata kar a domdar çêbibe, dawî li karavêtinê were, ewlehiya wan a tenduristiyê pek were û her wiha mafê wan ê sendika û grêvê were nasîn.

## Li gundê Hemamê çeteyan 6 kes revandin

Li Efrînê çeteyên dagirker li gundê Hemamê ya Cindirêsê êrîşî gel kirin. Hate gotin çeteyan ji malekê 6 kes revandin.
Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên bi ser wê de li Efrînê êrîşên ser gel didomînin.
Li gorî agahiyên xwecih li gundê Hemamê ya navçeya Cindirêsê ya Efrînê çeteyên Hemzet ketine malekê û ji yek malê 6 kes revandine.
Kesên ku gundî revandine navê duyan ji wan diyar bû. Tê gotin navê wan Evdo Raşîd Silêman û Ehmed Huseyin in.
Çeteyan bi ser gundê Burç Heyder ya Şerewa ya Efrînê de girtin û gelek kes revandin.



## Rêjîma Îranê 3 kolberên din kuşt

Mihafizên Şoreşê ya Îranê li herêma Urmiyê ya Rojhilatê Kurdistanê 2 kolber kuştin.
Li gorî nûçeya HRANA leşkerên Îranê beriya bi çend rojan li eyaleta Urmiyê, li ser sînorê Salmasê 2 kolber kuştin.
Her wiha diyar bû ku li ser sînorê Pîranşarê jî kolberek bi giranî birîndar bûye.

### 33 KOLBER HATIN KUŞTIN

6'ê Tebaxê, Duşemê berêvarê Mihafizên Şoreşê yên Îranê li herêma sînor a Pîranşarê ya Rojhilatê Kurdistanê li kolberan reşandibû û di encamê de kolberek hatibû kuştin û yek jî bi giranî birîndar bûbû.
Li gorî hesabên ANF'ê van çar mehên dawî 33 kolber hatin kuştin. Bi dehan kolber jî hatin birîndarkirin.



## Boko Haram 15 leşker kuşt

Li eyaletta Borno ya Nîjeryayê Boko Haram êrîş bir ser leşkeran û 15 leşker hatin kuştin.
Êrîşên Boko Haram ên li Nîjeryayê didomin. LI Eyaleta Borno ya Nîjeryayê Boko Haram êrîşek bire ser leşkeran û 15 leşker kuştin.
Jêderên Nîjeryayî gotin êrîş bi rengê kemînê hatiye kirin, beriya hilbijartina meha Sibatê ev êriş hatiye kirin.
Nîvê meha Tîrmeha jî li heman herêmê 20 leşkerên Nîjeryayê winda bûbûn.



Li vê herêmê gelak caran Boko Haram êrîşan dike. Ji 2009'an û vir ve 30 hezar kes hatine kuştin.





# Jiyan û mirina li sirgûniyê; Aram Tîgran

**Aram Tîgran ji welatê xwe dûr li sirgûniyê hate dinê û li sirgûniyê jî ji dinê koç kir. Aram Tîgran zêdeyîya temenê xwe da muzîka kurdî. Bi stranên xwe êş û derdên kurdan parve kir. Bû pira di navbera gelê Kurd û Ermen.**

Aramê Dîkran (wekî Aramê Tîgran jî tê naskirin; navê wî yê rast Aram Melîkyan), hunermendekî Ermenî ye ku bi Kurdî û Ermenî distrê. Di sala 1934'an de li bajarê Qamişloyê hatiye dinê. Aramê Dîkran di roja 8'ê tebaxa 2009'an de li Atînayê (Yewnanistan) çû ser dilovaniya xwe.
Gotineke bav û kalan heye wiha dibêje: "Tenê deng û huner dimînin û nemirin". Ji mêj de ye ku nermiya dengê tijî his û xweş yê Aramê Dîkran di nava civata Kurdan de tê bihîstin. Li Kurdistanê kesê ku dengê tijî êşq û evîn yê wî nebihîstibe, tine ye. Yek ji dengên ku hertim para kurdî ya Radyoya Êrîvanê di nava Kurdên her çar perçên Kurdistanê de dide guhdar kirin, dengê zelal ê Aramê Dîkran e. Deng û awazên hunermendên mîna Dawudê Xelo, Sosika Simo, Kawîs Axa, Karapêtê Xaço,Mihemed Arifê Cizîrî, Şeroyê Biro, Eyşe Şan, Hesenê Cizîrî, Aslîka Qadir, Nesrîn Şêrwan, Mecîdê Silêman, Reşîdê Baso, Meryem Xan, Fatma Îsa, Belga Qadir, Zadîna şakir, Aramê Dîkran û hwd… her roj zêdetir guhdarên Radyoya Êrîvanê zêdetir dikirin.
Lê di vê navê de pirsa herî girîng ji bo Kurdan ev bû ku Aram Tîgranê Ermenî çawa wiha ji dil û bi şewatek tijî soz dikare stranên kurdî bixwîne? Çawa dikare wiha li ser bedewiya deşt, zozan, dol û newal, mêrxas û egîdên Kurdan bistirê? Aram kî ye ku neketiye bin bandora siyaseta wan xwînmijên ku hertim dahola neyartiya likurd û Ermeniyan lêdixistin û neteweya kurd bi wê hîndê tawanbar dikirin ku di ferman û qirkirina Ermeniyan de li rex Osmaniyên xwinxwar, cih girtine ? Lê famkirina siyaseta çewta dagirkerên Kurdistanê ji mêj de bû ku di malbata Aramê mirovhez de hatibû famkirin.
Aram Tîgran bixwe di vê derbarê de wiha dibêje:
"Bavê min jî mîna gelek Ermeniyên din di çaxê tevkujiya Ermeniyan de bi riya Kurdan ji kuştina bi destê Tirkan hat rizgar kirin. Ji bona wê jî hertim ji min re wiha digot: Kurê min qedir û qîmetê gelê kurd bizanibe, Kurdan ji bîra neke. Keda wan li ser min pirr e, zehmetî û xiwêdana wan li ser min pirr e. Ewan min xwedî kirine û ger hûn çar bira û du xwîşik vê gavê li ser rûyê dinê dijîn bi xêra Kurdan e ku hûn dijîn. Heke dijmin min bikuşta, hûn jî nedihatin rûyê dinyayê. Ew axayê kurd ku çend salan bi nihênî ez di mala xwe de xwedî kirim û pişt re ez şandim Binxetê (Rojavayê Kurdistanê), jiyana me rizgar kir û bi xêra wan vê gavê hûn li rûyê dinê dijîn. Ji bona wê jî divê hûn vê keda wan qet ji bîra nekin. Bi stranên xwe zimanê kurd biqedirîne û van helbestên ku ez didime te bike stranên xweş. Tu bixwe jî bibe dostek baş ji Kurdan re û keda wan ticarî ji bîra neke."
Bi vî awayî Aram, li herderê bi birayên xwe yên kurd re jî û şîreta bavê xwe yê emeknas heya roja îro jî ji bîra nekiriye. Heya roja îro jî li ser vê rêya dûr û dirêj Aramê hêja dimeşe. Sala1966´an gelek Ermeniyên ku li welatê Sûriyê dijîn, vegerîn welatê bav û kalên xwe Ermenistanê. Li wir bû ku Aram bi hevkariya Xelîl Muradov ku berpirsyarên beşê kurd ya radyoyê bûn, bi awayekî berfireh dest bi karê xwe yê stranbêjiyê kir. Carek din jê re hat îsbat kirin ku kurd li her derê mêranî û mêvanperweriya xwe wenda nakin. Li wir bû ku Aramê evîndarê stirîn û awazên kurdî bi hevkariya Cemîla Celîl û Keremê Seyad bêtir ket nava deryaya stranên kurdî û bi melevantiya di nava vê deryaya bêbin de bû hosta û şehrezayekî pispor. Helbet Aram rihê kurdîtiyê û hezkirina zimanê kurdî ji bav û diya xwe girtine ku hertim di nava malê de bi hevre bi zimanê kurdî diaxivîn û behsa bextereşiyên kurdî û Ermeniyan dikirin.
Rêbaz hunerî û naveroka stranên Aram Dîkran bêtir vê rastiyê bi me didin zanîn ku ew bi şiyarî xebitiye û ji hunera resen hezkiriye. Awaz û helbestên wî ji nava dilê civata Kurdan derketine. Kiye ku strana "Bilbilo" nebihîse û Kurdistana bindest û bextreşiyên gelê Kurdî li ber çavên wî zindî nebin? Kîjan evîndar e ku strana "Keçê ji bona te ez dîn im" bibhîse û hêsrên evîndariya bi şewat nebarîne? "Stranên Hey lo lo delal", "Şev çû", "Çiyayê Gabarê", "Zîlan", "Diçim-diçim", "Bi hesreta Êrîvanê", "Çil-çil kezî", "Ey welato em heliyan", "Elmasa min ji dersê tê", "Ax dê û bavê me" û bi dehan stranên din bi riya Aram Dîkran ketin ser zimanê gel û ji Kurdan re bûn hebûnek netewî ku di nava rûpelên dîroka hunerê de nayên wenda kirin.
Bi serhev de mirov dikare bêje ku naveroka stranên hunermend Aramê Dîkran pênaseya hunermendî, kesayetî û dilpakiya wî ne. Bedewiya erdnigariya Kurdistanê, dewlemendiya ziman, stran û bi giştî kultura Kurdan, heza ji bo azadî û serxwebûna Kurdistanê, pêkanîna biratiya Kurd û Ermeniyan, evîna ji bo Gerîla û şervanên riya bi şan û şerefa azadiyê, evîna ji bo mirovantiyê, canfedayiya egîd û lehengên Kurdistanê ku bi netirsî canê xwe feda kirin, wefadarî û emeknasî û hwd… tev kevir




û binaxê stranên Aram Dîkran pêktînin.
Bi salaye ku ew wek dergevanekî xwendingeha hunera Kurdistanê bi dengê xwe yê germ û nerm dewlemendiya lorîk, stran û zimanê şirîn ê Kurdî bi bîra herkesî tîne. Aram bûye nîşana demokrasiya di navbera gelên Rojhilata Navîn de.
Dema ku ji sala 1915'an û pêde jenosîda li dijî gelê Ermen, Kurdan gelek ji wan di nava dilê xwe de veşartin. Kurdan nedikarîn bibînin ku neviyên Mongolan li ber çavên wan birayên wan bikujin.
Herkes nikare muzîkê bi guhdarên xwe bide hezkirin. Ger hunermend bi deng û awazên xwe di vî karî de biser nekeve, nikare muzîka xwe mîna xwarina rihê mirovan, pêşkêşî gel bike.
Di vî karî de Aram mamostayekî jîr e û dizane çawa hest û hisên gel bilivîne. Ji bona wê jî mamosta Aramê Dîkran di derbarê huner û hunermendiyê de wiha dibêje:
"Gava em dibêjin huner, du wate ji hunerê tên ber çav: Ya yekê hunerê jê dertê merîfet û ya duduyan hunera sazbendî û kilambêjiyê. Di nava van çend salan de hunerê rih daye min, nehişt ku ez zû êxtiyar bibim û min hertim xwe di nava gel de dît."
Aram hunermendekî bexteware. Ji ber ku wî di nava civakê de dilxweşî pêk aniye û mirovên hunerdost bi can û dil ji wî razîne. Hunera wî bi hêzek bêdawî di nava gel de hatiye pejirandin. Kilamên Aram yên evîndariyê rewşa sosyolojî û kilamên siyasî jî rewşa siyasî ya gelê Kurd didin nasandin. Mamostayê me Aram Tîkran bi pirensîbên xwe yên exlaqî û kesayetiya xwe ya bilind jî di nava Kurdan de xwedî rûmet û hurmeteke bilind e.
Aram kurê Dîkran Melîkyan di sala 1934'an de li Qamîşlê di nava malbateke hejar de hat dinê. Karê xwe yê hunerî bi evînek tijî his û xweşî ji temenê 18 saliyê di nava dewat û şahiyên Kurd û ErmenIyan de da destpêkirin. Bavê wî di karê stran gotinê de pir ew teşwîq kir ku riya hunerê bidomîne. Sala 1966'an bi malbata xwe re çûn Ermenistanê û heya sala 1985'an di Radyoya Êrîvanê de mîna xebatkarekî fêrmî xebitî.
Di sala 1990'an de wek penaber çê Ewropayê. Di roja 8'ê tebaxa 2009'an de li paytexta Yunaîstan Atînayê çû ser dilovaniya xwe.





## Pişavtin- Assimilation 2

Sîpan ŞÎNDA

Heftiya borî me qala pişavtin ango assimilationê kiribû. Emê vê heftiyê zêdetir li ser alê pişavtinê û encamên wê yên li ser çand û ziman bisekinin. Pişavtina çandî: Ji holê rakirina çand/çandên bindeste. Çi bi awayekî sîstematîk, çi bi destê dewletan bi darê zorê, çanda netewên bindest di nava demê de ji holê tê rakirin û di nav çanda pergala serdest de dihele û dibe weke ya wan. Ev di nava demekî kurt de pêk nayê. Ji bona ev pişavtina çandî pêk were sedsal, hezarsal sere derbas dibin. Lêbelê pergal her tim çanda netewa bindest di bin zextê de dihêle. Di nivîsa berê de me qala du rêbazên pişavtinê kiribû. Yek ya hişk û bi darê zorê, yek ji ya nerm û sîstematîk. Di pişavtina çandî de ji mixabin ev herdû rêbaz bi hevre tên bikaranîn. Lê pergal pitirê xwe rêbaza sîstematîk dide pêş. Armanca pergalê a herî mezin ji zimanê netewa bindest li wan bide ji bîr kirin. Ji bona zimanê wan li wan bide ji bîr kirin ji di serî de zimanê wan li ber çavê wan reş dike, kiçik dike. Bi riya perwerdehiyê û alavên weke televizyon, rojname, înternet, radyo, pirtûk, kovar, reklam û hwd xurtî û lazimiya zimanê xwe û qelsî û di jiyanê de nelazimiya zimanê di armanca pişavtinê de dide pêş û wê têxe di binhişiya wan de. Mînak dibêjin mane zimanê we di sazî û dezgehên dewletê de nayê şixwilandin, hûnê nekaribin bi wî zimanî çi karê dirav pêve bên bikin, di qada navnetewî de zimanê we nayê naskirin... û hwd. Bi vî hawî zimanê wan li ber çavên wan reş dikin. Mixabin ev rêbazên pergal bikar tîne pirranî kêrî karê wan tê. Îro rê û rêbazên pergalên serdest bigihînin armanca wan gelik zêde bûne. Netewên bindest ji mixabin pirrê caran xwe radestî pergala serdest dikin. Li hemberî wan nikarin alternatîfan pêş bixin. Pergalên qirêj û neyarê pirrçandiyê di vî warî de pisbor bûne. Îro li Tirkiyê gelik netewan ziman, çanda xwe ji bîr kirine. Mînak Çerkez, Laz, Abaza... Mixabin li her çar parça Kurd û çanda Kurdî ji di bin vê tehlûkê de ye.

Dema mirov di nava gel de digere mirov gelik mînakan dibîne ku ziman û çanda Kurdî di tehlûkeyek mezin de ye. Mînak li bakûr hema bêje çi zarok êdî nabêjin "YADÊ"! Sûna yadê/dayê dibêjin "ANA"! Mixabin ev ji dayîk nîşanî wan didin! Bes "ana" peyveka Tirkî ye. Li Rojava herwiha peyva "YABO/BAVO" ji wisa ye. Kes nabêje "BAVÊ FILANKES", hemî kes dibêjin "EBÛ FILANKES"! Lê peyva "ebû" ji Erebiye! Ev du peyvên ji bo zarokan û ji bo zimanê wan pirr girîngin, lê mixabin em wan ji jiyana xwe de dirakin! Min di berê de ji gotibû ez ne li pêjberî çi zimana me. Lêbelê parastin û axavtina zimanê me, peywira me ya exlaqî ye. Mîna van peyvan mirov dikare bi sedan mînakan bide.

Çi exlaqê pergalên mêtînger nîne. Ew tenê dixwazin bigihên armanca xwe û ji bo wê dişixwilin. Ew bi awayekî pragmatîst tevdigerin. Ji bo wan, rêbaza herî baş ji rêbaza wan herî zû digîhîne armanca wan e! Ev dibe bi darê zorê be, dibe bi perwerdehiyê be, dibe bi riyek din be ferq nake. Divê netewên bindest ji li gor vê hişmendiyê tevbigerin û li hemberî mêtîngeriyê rêbazên xwe parastinê pêş bixin. Ziman bingeha çandêye. Hebûna me girêdayî hebûna çanda me ye, hebûna çanda me ji girêdayî hebûna zimanê me ye.

# Piştî şer sûk ji nûve geş dibe

**Li taxa Şêxmeqsûd ya Helebê piştî ku bi salan şerên dijwar lê qewimîn niha hêdî hêdî jiyan lê asayî dibe. Sûka Şêxmeqsûd jî ku di şerde ziyaneke mezin dît û ruxiyabû ji nûve geş dibe. Welatî berê xwe didin sûkê û pêdiviyên xwe yên jiyanî pêşwazî dikin.**



Sûka taxa Şêxmeqsûd a Helebê, piştî vegera piraniya niştecihên taxê, ji nû ve geş bû. Lê ji ber topbarana çeteyan sûkê gelek zirar dîtiye û ji ber wê firoşkaran bang li şaredariyê kirin ku alîkariya wan bikin da ku sûkê sererast bikin. Sûka Xerbî ya taxa Şêxmeqûd ku di sala 1997'an de hatibû avakiirn, yek ji sûkên girîng yên Helebê bû. Beriya êrîşên çeteyan li ser taxê, ji ber erzaniyê pirraniya welatiyan berê xwe didan sûka Şêxmeqsûd. Piştî destpêkirina aloziya Sûriyê û dorpêçkirina çeteyên girêdayî dewleta tirk û di encama topbaranê de sûkê ziyaneke mezin dît. Li sûkê 700 dikan hatin rûxandin.

### JI NÛVE GEŞBÛNA SÛKÊ

Ev nêzî du sale hêdî hêdî jiyan vedigere sûkê. Li sûkê ji nûve dikan tên lê kirin û pêdiviyên jiyanî li sûkê tên dîtin.
Firoşkarên sûkê, ji bo sererastkirina sûkê bang kirin ku şaredarî alîkariya wan bike.
Welatiyê ji pêkhateya Ereb bi navê Ehmed Casim diyar kir ku sûk hêdî hêdî mîna berê zindî dibe û bihayê sûkê jî başe. Ehmed bang li şaredariyê kir deverên ku di encama şer de wêran bûne, sererast bike.
Hevseroka Şaredariya Gel a taxê Velantîna Ebdo destnîşan kir ku wan ji bo çareserkirina banê sûkê projeyek pêşkêş kiriye. Valentîna diyar kir ku ew ji bo çareserkirina pirsgirêkên kanalîzasyona sûkê û çareserkirina sererastkirina rêyan dixebitin.
Di dawiya axaftina xwe de hevseroka Şaredariya Gel a Şexmeqsûdê Valentîna Ebdo destnîşan kir ku ji bo bilindkirina asta sûkê û sererastkirina wê, divê firoşkar bi şaredariya re alîkar bin…*ANHA*

# Welatî dixwazin pirsgirêka avê çareser bibe



Şêniyên başûrê gundewarên Til Hemîsê ji ber tunebûna ava vexwarinê zehmetiyan dikişînin û neçar man ku avê ji sarîncan bikirrin.
Bi dehan gundên başûrê navçeya Til Hemîsê ji ber tunebûna ava vexwarinê zehmetiyan dikişînin. Qutbûna ceyranê nahêle ku xezanên avê bi temamî tijî bibin, her wiha ava herêmê şor e.
Sedema bingehîn a vê pirsgirêkê, 5 stasyonên avê yên navçeyê xirabe ne. Her stasyonekê av dida çend gundan. Lê niha ew stasyon bi hewcedariya sererastkirinê ne.
Di 2'yê Hezîrana borî de, Meclisa Qamişlo guhdarî giliyên şêniyên navçeyê kiribû û soza çareserkirina pirsgirêkê dabû. Lê beşek mezin ji van pirsgirêkan nehatin çareserkirin.
Ji ber wê û ji bo çareserkirina pisrgirêka ava vexwarinê, Şaredariya Gel a Til Hemîsê bi 28 xwediyên sarîncên avê re ji bo belavkirina avê ji gundên ku av nagihîjê li hev kir. Lê ev proje neçû serî û piştî 15 rojan rawestiya.
Şêniyên gundên başûrê gundewarên navçeya Til Hemîsê diyar kirin ku piştî rawestandina projeya avê, zehmetiyên wan zêde bûn û neçar man avê ji sarîncên taybet bi buhayê 300 lîreyên Sûriyê bikirrin.
Şêniyan bang li aliyên têkildar kir ku vê mijarê bişopînin û çareser bikin.
Têkildarî vê mijarê hevserokê Şaredariya Gel a navçeya Til Hemîsê Ebdullrehman El-Hadî wiha got: "Şerdarî ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê 28 sarînc, ji bo avê bigihîne gundên miajra gotinê amade kirin. Lê ji ber tevliheviya belavkirina avê ji aliyê xwediyên sarîncan ve, ev xebat piştî ku 15 rojan dewam kir, ji aliyê me ve hat rawestandin."
El-Hadî diyar kir ku ji bo bicihanîna pêwîstiyên herêmê bi awayekî domdar, hewcedariya şaredariyan bi kirêkirina du sarîncan ji bo her şaredariyekê heye.
Hevserokê Şaredariya Gel a navçeya Til Hemîsê Ebdulrehman El-Hadî diyar kir ku ji ber kêmasiya Muduriyeta Avê ya Qamişlo, xebatên sererastkirinê paşde man… *ANHA*

# Pirsgirêka ceyranê li Şehbayê çareser dibe

Şaredariya Gel a navçeya Fafîn a herêma Şehbayê bi hevkariya komîna gundê Xirnata, pêdiviya ceyranê ya şêniyên gund bi cih anî. Li gundê Xirnata destpêkê şêniyan ji ber kêmxizmetên bingehîn wekî av û kehrebeyê, zehmetî kişandin. Şaredariya Gel û komînan xebatên xwe yên xizmetguzariyê zêde kirin. ji bo pirsgirêka ceyranê çareser bibe jeneratorek ji şêniyên gund re hat peyda kirin.
Endamê Komîteya Xedemî ya Komîna Xirnata Betal Ebdî wiha got: "Armanca me peydakirina pêdiviyên şêniyan e. Piştî 4 mehan şaredarî bi alîkariya şêniyan jenerator peyda kir."…*ANHA*



# Li pîşesaziyê çavdêrî tune ye

Piraniya ajokarên Qamişlo ji ber hevnegirtina nirxê parçeyên guhertina wesayîtan û buhayê çêkirina wan bi gazinc in.
Buhayê parçeyên guhertina erebeyan di nav dikanên Herêma Pîşesaziyê de cuda ne. Her çiqas Meclisa Pîşesaziyê nirxê buhayan diyar kiribûn jî di nav bêçavdêriyê de, her firoşkarek bi awayekî keyfî parçeyan difiroşe.
Xwediyên wesayîtan li Qamişlo ji ber vê pirsgirêkê beriya çend mehan ve bi gazinc in û bang li aliyên têkildar dikin ku bi lez li ser vê mijarê rawestin û rê li ber bigirin.
Ajokarê erebeya barkirinê yê bi navê Ehmed Elî yê ji Qamişlo diyar kir ku her xwediyê dikanekê li gorî kêfa xwe parçeyan difiroşe. Nirxê hin dikanan guncaw in lê hinek din jî pir buha ne û got: Dema erebeya min xirab dibe, ez ji ber nedabînkirina buhayê parçeyan û karkeran, ditirsim ku biçim herêma pîşesaziyê."
Welatiyê bi navê Mihemed El-Erûd ê ji navçeya Çilaxa ye, xwediyê erebeya veguhestinê ye û li ser riya Qamişlo-Dêrîkê dixebite. El-Erûd diyar kir ku xwediyên dikanên pîşesaziyê li Qamişlo bi nirxa parçeyên guhertinê dilîzin. Ew li hember her parçeyekê du qat pere gezenc dikin û got: "Hin caran ji bo peydakirina nirxa parçeyekê xirab bûye, çend rojan dixebitim."
Serokê Meclisa Pîşesaziyê yê bajarê Qamişlo Mihemed Sadîq destnîşan kir ku meclis li ser dikanên pîşesaziyê geriya û got: "Eger ajokarek gilî bike û nirxê ne li gorî lîsteyê be, meclis hesab ji xwediyê dikanê dixwaze."
Sadîq bang li ajokaran kir ku kesên vê yekê dikin li meclisê gilî bikin û got: "Tenê bi vê rêyê, rê li ber kesên ku dixwazin bi buhayê parçeyan bilîzin, wê were girtin."…*ANHA*

## Çare



### Guncawbûn

Sîpan CAN

Her kes pisporê karê xwe ye. pîşeyek heye dibêje "karê ne karê te, mal wêranê te ye" ev pîşe bi zimanê erebî hîn zelaltir tê fêmkirin. Di qadên jiyanê de her mirovek erk û peywirek wî li gorî zanebûn û karê ku dizane bike heye. Ango, her kesek ancax di karekî ku dizane de û jê hez dike bibe xwedî tecrube û pêşketinan biafrirîne. Bi vê yekê, mirov dikare di nava civaka xwe de bibe xwedî rol û misiyona guhertin û pêşxistina projeyan. Bi wê rolê jî dikare di avakirina sazî, dibistan û her cure navendên xizmeta vî gelî de bibe faktorekî bingehîn di guhertin û veguhertinê de.
Mînak, bazirgan ji bo karibin qezencê bikin, di hemû aliyên jiyanê de pereyên xwe istîsmar dikin û di cihê rast de; lê bingeha sereke ya pêşketinê ew e çawaniya istismarkirina mjiyê mirovan di xizmeta gel de. Ango, dema mirovekî di aliyê guncaw de neyên bikaranîn wê pêşketin lawaz û sist be. ev jî pirsgirêkek bingehîn yê civaka me ya paşkatî û şûn mayî ye. lê; em nikarin tenê sucê bikin ya civakê, ji ber heya radeyeke mezin ev karê rêveberiya vî wealetî ye jî, ya rast, di serî de ev guncawbûn di lîsteya rêveberiyê de ger bê sererastkirin wê gelek pirsgirêk çareser bibin.
Nivîskarê navdar Resûl Hemzetof wiha dibêje " darê xwar siha rast nade, eger da jî berdewm nake" ango, istismarê mirovan ger ne guncaw be, dibe ku encamê demkî bidel; lê ew encam wê negihêjin armanca tê xwestin.
Pirsgirêk tuneye ku mirov çend karan bi hev û din re bike. Lê; pênc zebeş bi destekî nikare bê rahiştin. Îro gelek keseyet hene dixwazin bibin helbestvan, nivîskar, ajokar, bijîşk, endeziyar û xwedî giravî bibin mela jî. Ji ber wê, kesên bi vî rengî di gelek saziyên me de cih digirin û rê nadin kesekî din. Mixabin, ne bi xwe û ne jî di karê xwe de serkeftî dernakevê û di her karê ku keysbaz kiriye de nîvçû nîvçû dimîne û dibe sedema hilweşandin û paşxistina sazî û civakê.
Guncawbûn, ne tenê di aliyê kesyat mirov dikare binirxîne. Di gotin û hevokên helbestvan û nivîskarê me de jî guncawbûn nîne. Car carê, berhemên herêmê derdikevin, lê mixabin, ne li gorî demê ne.
Lewra, mirovên guncaw stûnên serke yên avahîsaziyê ne. Eger ew stûn li gorî avahî her wiha şert û mercên avakirinê ne guncaw bin, tekez wê ew avahî hilweşe. Di serî de rêvebir û pêde biçe ber bi jêr ve, ji bo karekî guncaw kesê guncaw neyê hilbijartin wê di pêşerojê de gelek xeletî û kêmasî derkevin holê, dibe ku heya astekê perwerde rolê xwe bilîze; lê pisporiya tê xwestin wê negihêje encamek guncaw, encama ne guncaw û armanca ne guncaw jî bi re bîne.



# Heta vegerê berxwedan wê dewam bike

***Berxwedana gelê Efrînê yê ji ber êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk li herêma Şehbayê bi cih bûne, berdewam dike. Rêveberên meclîsên herêma Şehbayê yên jin diyar kirin, ew tevî hemû kêmderfetiyan jî xizmeta gel dikin û pêdiviyên wan bi cih tînin. Rayedaran diyar kirin heta ku gel vegerin Efrînê wê berxwedana xwe dewam bikin.***

Derbarê kar û xebatên Meclîsa Şehbayê de Hevseroka Meclîsa Navçeya Ehrezê Fîdan Ebdo û Cîgira Hevseroka Meclîsa Şehbayê Fethiye Qasim anîn ziman ku tevî hemû kêmasî û kêm derfetiyan li Şehbayê wê heta dawiyê xebatêx xwe yên xizmeta gel berdewam bikin.
Berxwedana gelê Efrînê ku ji ber êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk neçar man ji Efrînê derkevin li Şahbayê berdewam dike. Piştî gelê Efrînê li Şehbayê bi cih bûn meclîsa Efrînê û ya Şehbayê jî ji bo gelê Efrînê dixebitin û li gor derfetên xwe xizmetê dikin.
Derbarê van kar û xebatan de Hevseroka Meclîsa Navçeya Ehrezê ya Kantona Şehayê Fîdan Ebdo û Cîgira Hevseroka Meclîsa Şehbayê Fethiye Qasim axivîn.
Fethiye Qasim diyar kir ku piştî êrîşên hovane yên dewleta tirk li ser Efrînê ji bo parastina gel deriyê Şehba ji gelên Efrînê re hat vekirin. Piştî ku gel bi rêxistin bû Meclîsa Şehba bi Meclîsa Herêma Efrînê re li gor derfetên xwe alîkariya gel dikin. Piştî gelê Herêma Efrînê di kampan de bi cih bûn komun hatin avakirin û bi awayekî rêxistinkirî kar û xebat hat meşandin. Her wiha di milê tendirustiyê de jî me xizmeta gelê xwe kir û me ji bo gelê xwe li gorî derfetên xwe nexweşxaneyek jî vekir."





Fethiyê wiha dawî li axaftina xwe anî: "Beşa sereke ya di navbera herdu herêman de beşa rêxistinî bû. Ev xebat jî li ser fikir û felsefeya Rêber Apo weke xebatek hevbeş tê kirin û ji bo rizgarkirina Efrînê tekoşîn li Kantona Şehba dewam dike."

### BERXWEDAN WÊ DEWAM BIKE

Hevseroka Meclîsa navçeya Ehrezê Fîdan Ebdo jî li ser kar û xebatên li Şehbayê wiha got: "Piştî Efrîn hat dagirkirin gel berê xwe da Şehbayê. Li Şehbayê ji ber ku em nikarin hemû pêwîstiyên gel pêşwazî bikin di rewşek zehmet de dijîn. Lê dîsa em wek Meclîsa Efrînê û Şehbayê ji bo xizmeta gelê xwe hertim li ser piyan e."
Fîdanê di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku tevî ku heta niha tu alîkarî ji gelê Efrînê re nehatiye û dewletên navneteweyî dawî li bêdengiya xwe neanîne jî wan li gorî derfetên di dest xwe de alîkariya gel di hemû waran de kiriye û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Em ê vê alîkariya xwe berdewam bikin. Piştî ku komun hatin avakirin êdî gel hêdî hêdî jiyana xwe bi rêxistin dike û berxwedana xwe dewam dikin heta ku vegerin ser axa xwe."…*JINNEWS*




Melek DEMÎRTAŞ

Di bin tava û germahiya herî dijwar de, jinên bajêr Qamişlo li gund û zeviyan çandiniyê dikin. Tevî ku di çandiniyê de hêza fîzîkî dixwaze jî, lê dîsa ew rûyên westiyayî ku li ber germahiyê matmayî bûye, hîn beşûşî wekî simbilê genim dikene. Ew jinan da ku debara mala xwe di milê aborî û manewî bikin wekî şaneya mûzan bê navber ked û xebatê dikin.

### KEDA BERBANGA SİBEHÊ

Girêdayî mijarê jina Ereb a binavê Rexda Samir ser zehmetî, çawaniya çandinî û xebata xwe ji rojnameya me re wiha vegot: "Em ber banga sibehê ku hîn roj nehilatiye dicin nav zeviyan û bi hêza dest alavên sivik dest bixebatê çandiniyê dikin. karê me wekî çandiniya kemun, aşêv û komkirina qirşikan e, dixebitin her wiha jî bistanên sebzeyan aşêvdikin, çi giyayê zêde an jî qirşik hebe dirakin ji ber ku we zerarê dide bexçe û sebzeyan baş berhem nade."

### Dİ HER MERCÎ DE JİN XWEDÎ Lİ MALBATÊ DERDEİKEV

Rexda da zanîn ku di dema nîvro de ji kes hene ku diçin malên xwe rehet dikin û hin li niav zeviyan dimînin û wiha dom kir: "Hin jin di dema nîvro de di çin malên xwe da ku xwariinê ji zarokên xwe re çêkin û malê bi rêvebibin. Piştî ku karê malê û xwarin xilas kirin, dîsa divegirin nav zeviyan û karê çandin, aşêvê heya dema êvarî diçin malên xwe."

### TENÎ Jİ BO DESTÊ XWE Lİ BER KESÎ VENEKİN

Rexda anî ziman ku jin ewqas kedê dike tenê ji bo ku xwe muhtacî kesî neke û wiha pêde çû: "Jin dev ji mal û zarokên xwe diqerin û diçin karê zeviyan, tenê da ku destên xwe ber kesî venekin, bi keda xwe mala xwe xwedî dike, tevî wiha jî heqdestê wan kli gorî keda wan kêm dimîne. Li gund mêr jî bi hevjîna xwe re di bin wê tava dijware ji bo peydakirina gepa nan dixebitinyanî bi kurtasî ji gund de jiyana komîna û wekhevî tê meşandin."

### WEK HEVÎ Û ALÎKARÎ TEV DIGERIN

Rexda Samir da zanîn ku di dema berê de musimê çandiniyê ji bo wan wekî musimê ked û berhemdayînê bû lê demaniha kêm bûue û wiha domand: "Di demên berê de ew alavên niha yên çandiniyê wekî derase nebûn, tenî dasik û mancel hebû bi keda destan çandinî dikir. Ji bo wê demasla havînî an jî musimê çandiniyê ji bo me gelekî girîng bû, ku me hemû pêdiviyên xweyî malbatê diqedan. Lê piştî pêşketina alavên çandiniyê wekî derase, em tenê ji bo sewlan an jî agirê tifikê qirşikan didin hev û kom dikin Wekî her musimî hemû jinên gund li hev dicivin, û bi yek destî bi hevre dibin alîkar da ku karê xwe bi lez bi dawî bikin, ew ked û zehmetî jî bi alîkariya jinana sivik dibe, mîna jiyana komînal û xwezayî."

# Emê bi têkoşînê rêber Apo azad bikin




Rêvbera têkliyên Diblomasiyê ya Kongreya Star Eliya Ogla diyar kir ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan kilîda aloziya li Rojhilata Navîn e û tecrîda li ser Rêber Abdulah Ocalan aloziya Rojhilata navîn kûr dike. Dewleta tirk tecrîdeke girankirî daniye li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û rê nade hevdîtina wî ya bi parêzer û malbata wî re. Têkildarî vê mijarê Rêvebira Têkliyên Diblomasiyê ya Kongreya Star tecrîda li ser Ocalan şermezar kir û got; "Ji 2011'an ve dewleta tirk tecrîdeke giran li ser rêber Apo pêk tîne. Ev tecrîda ku li ser Rêberê me tê meşandin dibe sedema krîzê li Rojhilata Navîn, ji ber ku rêber Apo Kilîda çareseriya vê krîzê ye."


### TECRÎD SÛCÊ MIROVAHIYÊ YE

Eliyayê di dewama axftina xwede da zanîn ku tecrîda li ser Ocalan sûcekî dijî tevahî mirovahiyê ye û wiha pêde çû; "Rêber Apo ji bo azadiya gelan heta vê rojê li ber xwe daye. Ji ber vê jî erka her mirovekî ew e ku xwedî li Rêber Apo derkeve."
Eliyayê di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku daxwaza azadiya Rêber Apo daxwaza demokrasî, aşitî û wekheviyê ye û di dawiya axaftina xwe de wiha got; "Rêberê me ji bo azadiya jinê û civakê her di nava têkoşînê de ye, lewma tecrîda li ser rêbertî tecrîda li dijî tevahiya mirovahiyê ye. Dewleta tirk a ku bi talankirin, tecawizkirin û kuştinê hate naskirin û li gel ku ev yek li Efrînê bi awayekî zelal tê xuyakirin jî dewletên navneteweyî û saziyên mafên mirovan derbarê van êrîşên dewleta tirk de bêdeng in. Em ê li ber xwe bidin heta ku em rêber Apo a azad bikin ,wekehvî û demkokrasiyê pêk bînin. Em ê serokê xwe azad bikin."…*JINNEWS*

# MSD rê li ber parçekirinê digire

Şîlan XOCE





Jinên li Kampa Serdem a koçberên Efrînê li Şehbayê dimînin derbarê gengeşeya danûstandinên Sûrî-Sûrî de nîrîna xwe ji rojnameya me re anîn ziman. Jinên Efrînê gotin: Ji bo ku rê li ber parçekirina axa Sûriyê bê girtin, pêwîste bi lez û bez aliyên ku nûnertiya civaka Sûriyeyê dikin li hev bicivin. Ji bo peydakirina çareseriyê jî lazime di zîtirîn dem de bi lihevkirina xwe rê li ber nexşeyên parçekirina axa Sûriyê bigirin.

### DIYALOGA HUNDIRÎN ÇARESERÎ YE

Derbarê hevdîtinên Meclîsa Sûriya Demokratîk MSD bi rejîma Sûriyê û lêgerîna MSD ya çareseriya aloziya Sûriyê de, jinên Efrînê yên li Kampa Serdem dimînin ev nirxandin kirin. Jina bi navê Roken Şêxo got: Nêzî heşt salan e li Sûriyê ji bilî xirabî, kuştin û wêrankirinê tune ye. Hemû hêzên derve ji bo parçekirina vî welatî li gorî berjewendiyên xwe destwerdana axa Sûriyê kirine. Talan û wêranî di asta herî jor de ne. Hemû aliyên mudexeleker jî, ji bo çareseriya aloziya Sûriyê ne xwedî proje ne. Di encamê de diyar dibe ku ji bilî gelên Sûriyê kesek nikare pirsgirêka vî welatî çareser bike. Ancax bi îradeyeke hundrîn û projeyeke gelên Sûriyê bi xwe ev alozî ji holê rabe. Ji ber vê jî pêwîste hemû beşên civaka Sûriyê li dora masyekê kom bibin û bi xwe aloziya Sûriyê çareser bikin.

### REVA JI DIYALOGÊ PARÇEKIRIN E

Sîham Abdulrehman ku ew jî nişteciya Kampa Serdem e di vê derbarê de ev tişt anî ziman: Gelekî girîng e diyalogên bi vî rengî bi pêş kevin. Ev diyalog dê rê li ber destwerdana derve û parçekirina axa Sûriyê bigire. Wê dagirkirina axa Sûriyê biqedîne. Di pêvajoya aloziya Sûriyê de isbat bû ku; ancax pirsgirêk bi riya lihevkirineke hundirîn çareser bibe. Sîham di axaftina xwe de got ku; Ya girîng danûstandin û ne cihê wê ye. Li kuderê dibe bila bibe, pêwîste êdî rejîm fêm bike ku bi zihniyeta berê nikare vî welatî bi rê ve bibe. Gereke rêzê ji xwîna ji vî gelî bigire. Êdî ji xwînrijandin, wêrankirin, talanî, destdirêjî û dagirkeriyê re bes e. Sîham dawiyê de got: Ji berê de rêveberiya Şoreşa Rojava gotiye ku ancax aloziya Sûriyê bi îradeya gelên Sûriyê û bi projeyeke xweser a gelên Sûriyê bi xwe çareser bibe. derveyî vê yekê kûrkirin û dirêjkirina aloziyê ye. Ji ber jî em bang li rejîmê dikin ku dest ji wê hişmendiya xwe ya berê berde û destê ku MSD dirêj kiriye li hewa nehêle. Helwesteke wisa dê rejîmê bi xwe têk bibe û wê Sûriyê jî di navbera hêzên destwerdanê de parçe bike…

# Dawiya dagirkeran li Efrînê nêzîk buye

***Serokê Desteya Karûbarên Derve ya Efrînê Silêman Cafer diyar kir ku dewleta Tirk ji bo ku armancên xwe bi pêk bîne komên çete bikartîne û got, "Dawiya dagirkeriyê li Efrînê nêzîk dibe, lewra jî kiryarên xwe yên hovane zêde kirine." Silêman Cafer bang li civaka navnetewî kir ku li dijî dagirkeriya dewleta Tirk bibin xwedî helwest.***

Serokê Desteya Karûbarên Derve ya Efrînê Silêman Cafer anî ziman ku dewleta tirk hewl dide projeya Ataturk a Peyman Milî zindî bike, ji lewre êrîşî başûrê Kurdistanê dike û mudaxeleyê li bakurê Sûriyê dike.



Serokê Desteya Karûbarên Derve ya Efrînê Silêman Cafer li ser zêdegaviyên dewleta tirk a dagirker li bakurê Sûriyê û li başûrê Kurdistanê axivî.
Cafer anî ziman ku ev siyaseta dewleta tirk xwe dispêre serdema Ataturk û wiha got: "Dagirkirina lîwaya Îskenderûnê destpêka pêkanîna Peymana Milî bû. Qonaxa duyemîn jî parçekirina herêmên ji Deryaya Spî heya Kerkûkê da ku bi hesanî dagir bike."
Silêman Cafer nerazîbûna xwe nîşanî helwesta Partiya Demokratîk a Kurdistanê PDK'ê ya têkildarî êrîşên dagirkeriya Tirkiyê da û wiha got: "Daxuyaniya serokwezîrê Herêma Kurdistanê ku tê de bang li PKK'ê kiriye ku bila ji başûrê Kurdistanê derkeve, cihê xemnginiyê ye. Kurdistan ne girêdayî partiyekî û ne jî milkê aliyekî ye, Kurdistan milkê hemû kurdan e. Îdeolojiya PKK'ê dibêje ku kurd li her çar parçeyên Kurdistanê ne, ji mafê vê partiyê ye ku li her cihê ku kurd lê ne hebe."
Cafer destnîşan kir ku dewleta Tirk hewl dide başûrê Kurdistanê dagir bike da ku serkeftinên xwe yên dîrokî ji nû ve zindî bike û da zanîn gelê kurd li hemberî dagirkeriya Tirkiyê tê dikoşe.
Silêman Cafer destnîşan kir ku dagirkeriya Tirkiyê ji bo ku armancên xwe bi cih bînin komên çete bikartîne û îşaret bi piştgiriya bi komên çete li Efrînê kir û wiha got: "Komên çete yên li Efrînê hîs dikin ku dawiya wan nêzîk bûye, ji ber vê yekê kriyarên xwe yên talankirin, revandin û xwestina pereyan li beramberî sebestberdana kesên revandine, zêde dikin."
Serokê Desteya Karûbarên Derve ya Efrînê Silêman Cafer zêdegaviyên dewleta tirk a dagirker ên li bakurê Sûriyê û başûrê Kurdistanê şermezar kirin û bang li raya giştî ya cîhanî kir ku dagirkeran ji herêmên ku dagir kirine derxin…*ANHA*

## Çareserî bi derxistina dagirkeran pêkan e



Hevserokê PYD'ê Şahoz Hesen got: "Her kes behsa çareseriya siyasî li Sûriyê dike, lê divê em gavên erênî ber bi çareseriya Sûriyê ve bavêjin. Bêyî rizgarkirina Efrînê û derxistina dagirkeriyê ji xaka Sûriyê çareseriya siyasî ne pêkane ye."
Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) bi armanca nirxandina geşedanên siyasî civînek li Akademiya Şehîd Yekta Herekol a li navçeya Tirbespiyê li dar xist.
Di civînê de Hevserokê PYD'ê Şahoz Hesen axivî.
Hesen di destpêka axaftina xwe de îşaret bi siyaseta dewleta tirk û dijberiya wê ya demokratîkbûna li herêmê kir û diyar kir ku dewleta tirk a dagirker dijberiya gelê Kurd û projeya demokrasiya li herêmê dike û got, "Tirkiyê xwedî heman zihniyeta DAIŞ û El Nusra ye."
Li ser hevdîtinên şandeya MSD'ê bi rêjîma Sûriyê re Şahoz Hesen got, "Her kes qala çareseriya siyasî ya Sûriyê dike, lê divê em gavên erênî ber bi çareseriya Sûrî-Sûrî ve bavêjin. Wekî Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ji berê de û niha jî em ji diyalogan re amade ne, lê divê aliyê din jî xwedî zêhniyet û zemîna diyalogê be."
Hesen di berdewama axaftina xwe de, diyar kir ku ew hewl didin Sûriyeke azad û demokratîk ava bikin û got, "projeya me hemû pêkhateyên Bakurê Sûriyê di nav xwe de digire."
Hevserokê PYD'ê anî ziman ku rizgarkirina Efrînê ji erkên destpêkê yên QSD û MSD'ê ne û got, "bêyî rizgarkirina Efrînê û derxisitna dagirkeriya Tirkiyê ji Bakurê Sûriyê çareserî siyasî ne pêkan e."

## Tecrîd li dijî pîvanên navnetewî ye

Cîgirê hevserokê Meclisa Şedadê Yasir Ebas diyar kir ku tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hemû maf û pîvanên navneteweyî binpê dike. Ebas destnîşan kir ku armanca dewleta tirk a dagirker ji tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, naxwaze felsefeya wî li Rojhilata Navîn belav bibe.
Li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û kiryarên artêşa tirk a dagirker ên dijmirovî cîgirê hevserokê Meclisa Şedadê ya girêdayî Hesekê Yasir Ebas axivî û tecrîd û kiryarên artêşa tirk a dagirker şermezar kir.
Ebas destnîşan kir ku ew wek gelê Ereb tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar dikin û da zanîn ku tecrîda li ser Ocalan tecrîda li ser hemû gelan e. Ebas wiha got, "Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan banga azadî û rizgarkirina gelên bindest dike, dewleta tirk a dagirker tecîrîdê li ser wî pêk tîne."
Ebas derbarê bêdengiya hêzên navnetewî ya li hember tecrîdê û got, "bêdengiya wan tê wateya hevkariya wan."
Ebas, wiha dewam kir, "Ji ber ku Ocalan li ser bingeha netewa demokratîk azadiya hemû gelan dixwaze lewra jî dagirker ji bo armancên xwe xetere dibînin."
Ebas destnîşan kir ku armanca dewleta tirk ji tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ew e ku felsefeya wî li Rojhilata Navîn belav nebe û got, "ji ber ku Tirkiye vê yekê li ser xwe wek xetere dibîne. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo azadiya jinan, gelên bindest û yekitiya hemû gelan di bin sîwana neteweya demokratîk de gelek têkoşîn kir û banga wekhevî




û yekitiyê di navbera hemû gelên herêmê de kir."
Cîgirê hevserokê Meclisa Şedadê Yasir Ebas di dawiya axaftina xwe de destnîşan kir ku kiryarên hovane yên dewleta tirk a dagirker li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hemû pîvanên navnetewî binpê dike û bang li hemû rêxistinên mirovî kir ku ji bo azadkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di zûtirîn dem de bikevin nava hewldanan."…*ANHA*

## Avakirina komîteyan ji bo berdewama têkiliyan e

Endamê Desteya Siyasî ya MSD'ê Hesen Mihemed Elî diyar kir ku armanca wan ji avakirina komîteyên ku di civîna wan a li gel rêjîmê de lihevkirin li ser pêk hat, ji bo berdewama hevdîtinan û têkiliyên di navbera her du aliyan de ye.
Meclisa Sûriya Demoratîk MSD'ê nûnerê sereke ya hêzên siyasî û leşkerî li Bakurê Sûriyê ye. Ji ber vê yekê û li ser xwesteka rêjîma Sûriyê beriya demekê civînek di navbera MSD`ê û rêjîma Sûriyê de li paytexa Sûriyê Şamê hate lidarxistin. Di civînê de lihevkirin li ser avakirina komîteyên di navbera her du aliyan de ji bo berdewamkirina hevdîtinan û şopandina di navbera her du aliyan de, pêk hat.
Endamê Desteya Siyasî ya MSD'ê Hesen Mihemed Elî diyar kir ku komîte wê ji bo şopandina karûbarên rêveberiya herêmê û ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê werin avakirin.
Hesen Mihemed Elî destnîşan kir ku di civîna wan li gel rêjîma Sûriyê de li ser avakirina komîteyên taybet ji bo şopandina karûbarên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk û rêveberiyên herêmî yên Bakurê Sûriyê lihevkirin pêk hat.
Mihemed Elî diyar kir ku armanca wan ji avakirina komîteyan ew e ku têkiliyên di navbera her du aliyan û nûnerên Bakurê Sûriyê û rêjîma Sûriyê de bidomin. Mihemed Elî diyar kir ku heta niha nav û karê gelek komîteyan nehatiye diyarkirin û wekî ku hatiye payîn wê di nava demên bê de werin diyarkirin.
Endamê Desteya Siyasî ya Meclisa Sûriya Demokratîk Hesen Mihmed Elî destnîşan kir ku wê di pêngava pêş de komîte û karên wan werin diyarkirin da ku aloziya Sûriyê bi dawî bibe…*ANHA*

## Divê pirsgirêka Îranê bi têkoşîna gel çareser bibe



Îbrahîm Elîzade diyar kir ku ew aliyên ku qala destwerdana li ser Îranê ya ji aliyê Emarîka ve dikin, şaş in û got: "Ji ber ku baweriya wan bi gel nîne, bawer nakin ku bi xebata gel encam wê bê girtin."
Sekreterê Rêxistina Kurdistanî ya Hizbî Komunîst a Îranê (Komele) Îbrahîm Elîzade pêşketinên li Îran, Rojhilatê Kurdistanê nirxand.
Îbrahim Elîzade di nirxandinên xwe de bal kişand ser van xisûsan:
Divê qonaxê de muxalefeta Îran û Kurdan ji hemû deman zêdetir ketine nav tevgerê. Her aliyek hewl dide li gorî nêrînên xwe alternatîfek piştî ruxîna rejîmê bi cih bike.
Ev tevgerên ku niha hene li gel yên berê cuda ne. Hemû çav li ser desthilatê ne. Lê ya diyar ew e ku kîjan bêhtir alternatîfe û şansê wan zêdetire. Eger hemû alî partî ji bo rejîmê bibin alternatîfek tiştek ne aqlane ye. Li hember bûyeran nikare bibin bersîv. Lê li gorî me tenê alternatîfek radîkal, mirovî, sosyalîstî û karkerî dikare ji bo daxwazên gel bibe bersîv..
Ew aliyên ku qala destwerdana Amarîka li ser Îranê dikin şaş in. Ji ber ku baweriya wan bi gel nîne. Bawer nakin ku bi xebata gel bi encam bibe. Em wek Komele li dijî destwerdê ne. Ji ber ku tenê eger guhertinek di xizmeta gel de be, divê di nav Îranê de pêk were.
Elîzade li ser nexşerêya KODAR'ê jî wiha got, "Rast e, projeyekî yek alî û sazî ye. Di nexşerêyê de hinek xwestek û daxwazên gel hatine bicihkirin ku di cih deye. Lê ya ji bo me cihê rexneyê ye, di nexşerêyê de xebatên ku ji bo rûxandina Komara Îslamî hene, ji bo hilweşandinê têrê nakin. Ew qonax temam bûye. Em di nexşerêyê de li ser wê xalê nakok in. Lê li gel rexne kirinê ji ev bandor li peywendiyên me li gel KODAR û PJAK'ê nake.



# Desteya Rêveber a Şengalê biryarên girîng girt

***Desteya Rêveber a Şengalê, civîna xwe ya asayî lidar xist. Di civînê de bi minaseta 14 û 15'ê Tebaxê ku salvegera komkujiyên gundê Koço, Sîba Şêxidir û Til Izêr in, bernameya çalakiyan hat derxistin. Desteyê her wiha ji bo ji nûve avakirina cihên pîroz û xizmetguzariyê jî komîte ava kirin.***

Desteya Rêveber a Şengalê bi minaseta 14 û 15'ê Tebaxê ku salvegera komkujiyên gundê Koço, Sîba Şêxidir û Til Izêr in, bernameya çalakiyan derxist. Desteyê her wiha ji bo ji nûve avakirina cihên pîroz û xizmetguzariyê jî komîte ava kirin.
Desteya Rêveber a Şengalê ku rêveberiya herî jor a Şengalêye, civîna xwe ya asayî lidar xist.
Di civîna ku nûnerên meclîs û saziyan jî tevlî bûn de, xebatên li herêmê hatine meşandin hatin nirxandin û plansaziya dema pêş hat derxistin.
Di civînê de bi minasebeta salvegera komkujiya gundê Koço (15 Tebax) û komkujiyên gundên Sîba Şêxidir û Til Izêr (14 Tebax) bernameya bîranîn û çalakiyan hat derxistin.
Li gorî vê yekê wê Meclîsa Rêveberiya Xweseriya Demokratîk serdana gundê Koço bike û daxuyanî bide. Her wiha wê bang li hêzên navnetewî bê kirin ku gundên Êzidiyan ji mayinan bên paqijkirin da ku welatî karibin vegerin gundên xwe. Tê plankirina ku li Şengalê jî daxuyanî bên dayîn.
Di civînê de bi armanca ji nûve avakirina cihên pîroz ên Êzidiyan (qube) ku ji aliyê DAIŞ'ê ve hatine hilweşandin, komîteyek hat avakirin.
Her wiha ji bo çareserkirina pirsgirêkên xizmetguzarî yên wekî rê, kehrebe û avê ya gundê Digurê jî komîteyek hat avakirin.



## Banqe û şîrketên Tirk wê hilweşin



Nirxê lîreyê Tirk li bara Dolarê Amerîkayê kêm dibe, pisporên biyanî ên aboriyê dibêjin Tirkiye wê nikaribe ji bin vê krîzê rabe û pêşî banqe, piştre jî şîrket wê birûxin.
Piştî rejîma Erdogan Andrew Brûnson ê ku rehîn hatî girtin bernade, rêveberiya DYA'yê li ser Tirkiyê biryara zexta aborî stand û ji hingî ve lîreyê Tirk li bara dowîzê ji nirx dikeve. Ji serê salê ve lîreyê Tirk 40 ji 100'î li bara dolaran ji nirx ket, têgotin di vê demê de lîreyê Tirk 29 ji 100'î heliyaye.
Li gorî pisporên biyanî ên aboriyê Tirkiye nema dikare ji bin vê krîzê rabe û fatûraya krîzê li pey hev wê li saziyên fînansê û piştre li şîrketan were birîn. Li gorî pisporan pêşî şîrket wê nikaribin deynê xwe bidin û piştre sermiyana banqeyan wê bihele.
Jakob Chrîstensen, yek ji pisporê fînansê ya Bank Danske, ku mezintirîn benqeya Danîmarkayê ye û li gelak welatên cîhanê sermiyana wê heye, got, "Êdî piyaseya biyanî ji bo Tirkiyê senaryoya herî kambax hazir dike, tirsa ku banqe û şîrket wê nikaribin deynê xwe bidin serdest e."
Wladîmîr Mîklaschewskî, yek ji pisporê heman banqeyê got, "Heke lîreyê Tirk dîsa xwe bi ser hev de neyine, encamen vê wê weke kevirên domînoyê bin, şîrket ku nikaribin deynê krediyan bidin, wê benqe birûxin."
Lucas Irîsîk, yek ji rêveberê Nîkko Assten Management, ku yek ji koma fînansê ya navdar a Japonyayê ye, ji pisporê din cudatir difikire. Texmîna Irîsîk a ji bo demek kurt wiha ye: "Ji nirx ketine lîreyê Tirk di demeke nêz de wê aboriya Tirk giran bike û wiha çerx wê nema bizîvire."
Beriya bi çend rojan yek ji saziya fînansê ya DYA'yê Goldman Sachs jî got heke lîreyê Tirk wiha ji nirx bikeve û dolar /lîre bibe 7.1 sermiyana zêde ya benqeyên bi navenda Tirkiyê dibe ku bihelin.

## Li Iraqê encamên hilbijartinê neguherîn



Encamên hilbijartina 12'ê Gulanê yên ku bi dest hatî kirin hate aşreker kirin. Zêde tiştek neguherî.
Piştî ku gelek gazinên ku hîle hatine kirin Desteya Hilbijartina Bilind Hezîranê biryar li ser da ku dîsa deng werin hijmartin.
Li gorî hijmartina ku bi destan hatî kirin tifaqa Sarîûn a lîderê Şiî Mukteda Sadr û komunîstan, bi 54 kursiyan bû yekem.
Tekana guherîn têkildarî Tifaqa Fetîh e ku şervanên Heşdî Şebî yê nêzî Îranê di bin banê wê de civiyane. Tifaqa Fetîh di hilbijartina 12'ê Gulanê de 47 kursî bi dest xistibûn û di ya nû de ev bû 48. Her wiha dîsa bû tifaqa duyem.
Lîsteya Serokwezîr Haydar Ebadî 42 kursî stand, lîsteya Iyad Allavî ku gelek Sinî jî pê re ne 21 kursî stand. Lîsteya Ammar EL Hakîm Hîkma 19 kursî stand.
Li Herêma Kurdistanê jî PDK 25, YNK 17, Goran 5, Tevgera Nifşê Nû 4 kursî stand.
Li gorî van encaman ti lîste bi serê xwe nikare hikûmetê ava bike. Ji bo 329 wekîlî pêdivî bi tifaqê heye.
Piştî ku Komîsyona Hilbijartinê ya Bilind encamên dawî ragihand, divê Serokkomar di nav 15 rojan de divê bang li parlamentoyê bike ku bicive, da ku serokkomar hilbijêre. Serokkomar jî di nav koalisyona piranî de wê Serokwezîr hilbijêre.

## DYA'yê şerê aborî da destpêkirin



Serokwezîrê Rûsyayê Dîmîtrî Medvedev li ser zextên aborî yên Washîngtonê yên li ser Moskowê got, "Ragihandina şerê aborî ye".
Rêveberiya DYA'yê têkildarî jehrdana sîxûrekî Rûs ê berê ya li Qraltiya Yekbûyî Pêncşemê zextên aborî yê nû yên li ser Rûsyayê ragihandin. Qesra Spî her wiha hişyarî da û got siberojê dibe ku zextên aborî yên pêla şeşan jî pêk bînin.
Li gorî ajansa nûçeyan a înterfaxê Medvedev derbarê zextên aborî de got, ''Heke xebatên banqeyekê an jî qedexekirina pereyekî hebe, mirov eşkere bibêje ev şerê aborî ye." Medvedev wiha got, ''Bi teqezî divê mirov bersivê bide vî şerî. Bi rêyên aborî, siyasî û rêyên din." Serokwezîrê Rûs got, "Divê dostên me yên Amerîkî bi vê zanibin."
Qesr Kremlînê li ser zextên li ser berhemên teknolojik jî gotibû, ''Nayê qebûlkirin" , "ne dostane ye" û "îllegal e."
Rêveberiya Serokê Amerîkayê Trûmp sinyal da ku wê pêleke nû ya zextan were û wê nehêlin ku şîrketên rêya hewayê ya Rûs li balefirgehên DYA'yê xwe deynin û têkiliyên dîplomatîk ên du welatan dibe ku werin sekinandin.

## Rejîma Sûriyê xwest teslîm bibin

Rejîma Sûriyê xwe ji bo operasyona Idlibê amade dike. Hêzên artêşê ji hewayê ve belavok belav kirin û bang li şêniyan kir ku teslîm bibin.
Hêzên rejîma Sûriyê li rojavayê bakurê welêt li Idlibê bi rêya hewayî belavok belav kirin. Di belavokan de hate gotin: ''Şer bi dawî dibe. Em bang li we dikin ku bi rengê Sûriyeyiyan tevlî nav peymana lihevkirinê bibin. Hevkariya we ya bi artêşa Sûriyê re wê we ji rêveberiya militan û terorîstan rizgar bike, wê jiyana we û malbata we biparêze."
Hikumeta Sûriyê got, "komên çekdar ku hurmetê ji dewleta hiqûqê re bigirin wê peymanên li hevkirinê efûyê ji bo wan bîne. Komên li gor vê divê çekên xwe radest bikin."
Idlib yek ji wan herêmên mezine ku komên çekdar lê ne. Çete rasterast bi rejîma Enqerê re têkildar in. Hedefa operasyona rejîmê ya piştî niha Idlib e.

